Tu jêderka vîna min î.

Mihemed ELÎ

efrin2612@hotmail.com

Li vê mişextiya din bin baskên ewrine reş de dike nêçîra hestên min î azad,

ez nema dihizirim pêjna te

nema dibihîsim awazên te

nema dipelînim zîziya sîngê te

û nema dibînim hemû wateyên kilê li dor çavên te.

Li wir li ber qiraxên Wan, Urmiye û Meydankê hemû wateyên kilê vegirtine dîlana azadiyê û li ser awên hebûna te ya esfûnê herman hildiperin…

Çend car in ez hewl didin biçirînim perdeya van ewrên neyar û têkevim dîlana wateyên hebûna te, lê mixabin, bêbextiya kurdên xwefiroş best dikin lingên min û bêbaviya dijmin batax dike laşê min.

Her çend kirêt û nemirov bin ev dijminên dost, henaseya gulên bihara te azad dike zimanê min, solîna berfa çiyayên te rewan dike zarê min…

Ez bi rehên dilê xwe dikulim dîwarên vê zîndana azad û bi çîrokên te yên regreng ditonînim dilreqiya van ewrên bêsinc…

Bern 28.12.2009